# Kurdistan

Rojnameyek ji aliyê ragihandina navendî ya PDK-Sê ve tê weşandin

PDK-S 1957

Rojnamakurdistan.com | Kurdistan-Hejmar (257) | Çirya Paşîn / 15-11-2023


# Bi beşdariya şandeke PDK-S, civîneke siyasî li bajarê Hannover yê Elmaniya birêve çû





**Kurdistan-Elmaniya**

Li ser vexwendineke Partiya Welatparêzên Kurdistanê (PWK), şandek ji şaxê 1ê Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya bi serokatiya endamê Komîta Navendî Xalid Kemal Derwîş roja 11.11.2023an, beşdarî civîneke PWK li Bajarê Laatzen/ Hannovera Elmanya bû. Şanda PDK-S, di destpêkê de pîrozbahî li PWK kir li ser serkeftina kongreyê yekbûnê, ku PWK jê hate avakirin, piştre behsa rewşa Kurdistana Sûriyê bi giştî hate kirin û helwesta PDK-S ji bûyerên heyî re. Di civînê de, ku partiyên Kurdistanî û kesayetiyên serbixwe jî beşdar bibûn, beşdaran behsa rewşa siyasî ya Rojava û Bakurê Kurdistanê kirin, herwiha tekezî li ser karê revenda Kurd yê hevbeş hate kirin. Partiya Welatparêzên Kurdistanê (PWK) ji yekbûna herdu partiyên berê Partiya Azadiya Kurdistanê (PAK) û Tevgera Demokratîka Kurdistanê (TEVGER) hatiye avakirina, ku di 9-10ê Îlûna 2023an de kongreyê xwe yê yekîtiyê li bajarê Amedê lidar xist û Mistefa Ozçelîk jî weke serokê partiyê hate hilbijartin. PWK daxwaza mafê çarenivîsê ji gelê Kurd re dike û sîstema federal weke sîstemeke guncaw ji rewşa niha re ji gelê me li Bakurê Kurdistanê re dibîne.

## Zarok li bakurê Sûriyê bê xwendin dimînin

**Kurdistan**

Li bakurê rojavayê Sûriyê ku di bin kontrola çekdarên opozisyona Sûriyê de ye, yek milyon zarok ji xwendinê bêpar mane. Li gorî saziyeke Netewên Yekgirtî jî, şer û aloziya li wê navçeyê bandoreke xirab li xwendina zarokan kiriye. Temamkirina wê *Rû—3*



**27 sal bi ser şehîdbûna xebatkarên Kurd Kemal Derwîş û Şêxmûs Yûsif re derbas dibin** *Rûpel—2*

**Dara azadiyê bi xwîna pakrewanan tê avdan** *Rûpel—3*

**Şîlan Doskî pirtûka bi navê Kurdica “Kurdîka” belav kir** *Rûpel—4*

# 27 sal bi ser şehîdbûna xebatkarên Kurd Kemal Derwîş û Şêxmûs Yûsif re derbas dibin

Kurdistan

Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya PDK-S li bajarê Qamişlo û li goristana Qidûr Beg 27'emîn salvegera şehîdbûna herdu serkirde, Emîndarê berê yê partiyê Kemal Ehmed Derwîş û Endamê Mekteba Siyasî ya Partiya Çep a Kurd li Sûriyê Şêxmûs Yûsif vejand. Di merasîmê de, Sekretêrê Partiya Demokrata Kurdistan-Sûriya Mihemed Ismaîl û serkirde û endamên partiyê amade bûn. Mihemed Ismaîl di gotarekê de behsa herdu şehîdan kir û ragihand, herdu kesayetiyan jiyana xwe di berevanîkirina di ber mafên niştîmanperwerî û netewî yê gelê Kurd li Kurdistana Sûriyê derbas kirine, û dazanîn ku kesayetiya Kemal Ehmed Derwîş rastgo û qurbanîdan bû ji bo doza gelê xwe li ser rêbaza Barzaniyê nemir û dê ev bîranîn bibe berdewamiya xebat û xebata siyasî heta ku gelê Kurd mafên xwe yên rewa bidest bixe. Mihemed Ismaîl tekez kir, ev xebatkar pencemora wan li ser pêkanîna armancên partiyê û bidestxistina mafên rewa yên gelê Kurd li Kurdistana Sûriyê hebû, û rola wan di bihêzkirina partiyê û yekgirtina gotara Kurdî hebû, herdu partî bûne yek û ev yek pêngaveke giring bû, û dê xebata xwe ya siyasî berdewam bike heta mafên rewa yên gelê Kurd li Kurdistana Sûriyê pêk werin. 27 sal li ser şehîdbûna serkirdeyên Kurd, Emîndarê Giştî yê berê yê Partiya Demokrata Kurd li Sûriyê El Partî ku niha bi Partiya Demoqrata Kurdistan-Sûriya PDK-Sê naskirî ye Kemal Ehmed Derwîş û Endamê Mekteba Siyasî ya Partiya Çep a Kurd li Sûriyê, Şêxmûs Yûsif, ku di encama bûyereke trafîkê de li ser rêya Hesekê-Qamişlo, di 03.11.1996'an, şehîdbûn, derbas dibe.




**Kemal Ehmed Derwîş:**

Şehîd Kemal Ehmed Derwîş di sala 1939'an de li bajarê Serê Kaniyê yê Kurdistana Sûriyê ji dayîk bûye, qonaxên xwendina xwe ya seretayî, navîn û amadeyî li dibistanên Hesekê bi dawî anî, paşê derbasî zanîngeha Helebê bû, û li wir bawernameya yasayî wergirt. Di sala 1958'an de tevlî refên partiyê bû, û di sala 1970ê de wek endamê komîta herêmî ya partiyê hate hilbijartin, û di sala 1977'an de wek endamê komîta navendî ya partiyê hate hilbijartin. Di sala 1979'an de wek sekreterê giştî yê Partiya Demokrata Kurd li Sûriyê (El-Partî) hat hilbijartin. Kemal Ehmed Derwîş yek ji wan kesan bû, ku yekemîn hevbendiya Kurdî li Sûriyê damezrand, di heman demê de yek ji wan kesan bû, ku hewla avakirina Hevbendiya Demokrata Kurdî ya dawî li Sûriyê da, wek nûnerê partiyê û Tevgera Niştimanî ya Kurd li Sûriyê di Parlemana Sûriyê de hat hilbijartin.

**Şêxmûs Yûsif:**

Şehîd Şêxmûs Yûsif di sala 1948'an de li gundê Qetraniya navçeya Çil Axa ya Dêrikê ji dayîk bûye, ji malbateke ku bi welatparêziya xwe ya resen tê naskirin, di sala 1965'an de tevlî refên Partiya Çep a Kurd bûye. Di sala 1987'an de wek endamê Komîta Navendî ya Partiya Çep a Kurd hat hilbijartin, û di sala 1993'an de bû endamê Mekteba Siyasî û di sala 1992'an de yek ji damezrênerên Hevbendiya Kurdî bû. Herdu şehîd Kemal Ehmed Derwîş û Şêxmûs Yûsif di 3ê Mijdara 1996'an de, li ser rêya Hesekê-Qamişlo di encama bûyereke trafîkê de şehîd bûn, piştî ku ji erkekî fermî ji Hesekê vegeriyan derbarê serjimêriya sala 1961ê de li dijî gelê Kurd, û bêparkirina beşekî mezin ji wan ji welatîbûnê.

# Dara azadiyê bi xwîna pakrewanan tê avdan

**Hêvî Delî- Qamişlo**

Hêzên pêşmergeyên Kurdistana Sûriyê " Leşkerê Roj" giyanê xwe yê pak ji bo riya têkoşîna azadî û serfirazî û rizgariya doza gelê xwe canê xwe baxiş kirin û hemû mînakên qehremaniyê di şerê rûbirûbûna rêxistinên terorîst DAIŞê de tomarkirin, û navê xwe di rûpelên dîrokê de nivîsandine û bi xwîna xwe axa Kurdistana pîroz avdan. Leşkerê Roj ji dema damezirandinê û ta niha di bin sîbera Ala Kurdistanê bi hezaran têkoşer tevlî nava refên Pêşmerge bûn, bi baweriyek bihêz bi rêbaza Barzaniyê nemir û ji bo parastina rûmeta miletê xwe û ji bo ku rê li ber êrîşên terorîst ên dijî gelê me bigirin û azadiya gelê xwe û hêvî û armancên yekîtî, azadî û serxwebûna xaka Kurdistanê pêk bînin, û ji bo berevaniya milet û xaka Kurdistanê de û di dema pêkanîna erkên xwe de bi dehan ji Pêşmergeyên Leşkerê Roj şehîd û birîndar ketine . Di vê derbarê de, di roja 12ê mijdara sala 2015 û 2016an de, hejmarek ji pakrewanên Pêşmergeyên Leşkerê Roj ku di encama şerekî dijwar di rûbirûbûna rêxistinên DAIŞ canê xwe kirin fîda, ku her bîranîna şehîdên cangoriyên azadiyê bibe hêz û hêviya berdewamiya têkoşîna rizgariyê.

**Navê wan şehîdan li gor cih û dîroka şehîdbûnê ev in:**
Pakrewan: Ehmed Bozan Qiço . _pile: pêşmerge _jidayîkbûn: Amûdê -Cih û dîroka şehîdbûnê : Gundê Kolat 12/11/2015. * Pakrewan: Şêrzad



Mehmûd. _jidayîkbûn: Qamişlo. _ Cih û dîroka şehîdbûnê: Gundê Kolat 12/11/2015. * Pakrewan: Etûf Tahir Omer . _jidayîkbûn: Girgê Legê. _ Cih û dîroka şehîdbûnê: Benda Bendava Mûsilê 12/11/2016. * Pakrewan: Kamîran Selah Eldîn Hiso. _ jidayîkbûn: Qamişlo. _ Cih û dîroka şehîdbûnê: Bendava Mûsilê 12/11/2016. * Pakrewan: Mewlûd Riyad Yûsif. _jidayîkbûn: Tirbespiyê. _Cih û dîroka şehîdbûnê: Bendava Mûsilê 12/11/2016. *Pakrewan:Sîpan Yûsif Sedûn Sîno. _jidayîkbûn: Dirbisiyê. _Cih û dîroka şehîdbûnê: 12/11/2016. Û hêjaya were gotin ku hêzên pêşmergeyên Kurdistan Sûriyê yên naskirî bi " Leşkerê Roj " ya ser bi Encûmena Niştimaniya kurd li Sûriya ve ye, ku ji keç û xortên Rojavayê Kurdistanê pêk tê, ku di roja 12/3/2012,bi biryarek ji Serok Mesûd Barzanî hate damezirandin, û ji aliyê kadroyên leşkerî yên hêzên pêşmergeyên Herêma Kurdistanê ve hatine perwerdekirin û êdî Leşkerê Roj bi hêz û qehremaniya xwe beşdarî şerê tund bûne û roleke mezin di rûbirûbûna Rêxistinên terorîst de berxwedaneke lehengî pêkanîna.. Û heta niha pêşmergeyên leşkerê roj bi geşbûna hestên netewayî û yekbûnê di xebata xwe de berdewamin, û li hêviya biryareke siyasî ne ku vegerin Kurdistan Sûriyê û xak û devera xwe biparêzin û ji bin destê dijmin rizgarbikin..

# Bakurê Sûriyê.. Zarok ji xwendinê dûr ketine

**Kurdistan**

Li bakurê rojavayê Sûriyê ku di bin kontrola çekdarên opozisyona Sûriyê de ye, yek milyon zarok ji xwendinê bêpar mane. Li gorî saziyeke Netewên Yekgirtî jî, şer û aloziya li wê navçeyê bandoreke xirab li xwendina zarokan kiriye.
Ji ber salên dirêj ên şer û pevçûnan, gelek ziyan gihiştiye kerta perwerdehiyê li Sûriyê, bandor li gihîştina xizmetên perwerdehiyê bo 2.2 milyon zarok kiriye û bûye sedem ku yek milyon zarok jî ji xwendinê bêpar bimînin.
Li bakurê rojavayê Sûriyê ku hîn jî şer û alozî berdewam e, yek milyon zarok bê xwendin mane û li gorî dawî raporta Li gorî Ofîsa Hevahengiyê ya Karûbarê Mirovî ya ser bi Netewên Yekgirtî ve, ji 2.2 milyon zarokên ku li wê navçeyê dijîn, yek milyon bê xwendin in.
Herwiha ji ber rewşa ewlehiya wê navçeyê, %57 ji xwendekarên qonaxa seretayî bê dibistan in û %80 xwendekarên qonaxa amadeyî nikarin bigihin dibistanên xwe.




> **Milyonek zarok li bakurê rojavayê Sûriyê ji xwendinê bêpar in**

Rêxistina navbûrî di raporta xwe dibêje, ji destpêka meha Cotmeha 2023an û di encama aloziya ku li navçeya bakurê rojavayê Sûriyê heye, ziyan gihiştiye 24 navendên perwerdehiyê, herwiha 120 hezar kes jî derbider bûne ku 40 hezar ji wan zarok in.
Li gorî raportên navdewletî, %50 ji navendên perwerdehiyê li seranserî xaka Sûriyê, ziyan gihiştiye wan.
Herwiha %50 ji zarokan qonaxa xwendina asta seretayî bidawî nekirine.
Ji bilî şer û aloziyê, rewşa aborî ya wî welatî di çenda salên dawiyê de bandora xwe li xwendinê kiriye û bûye sedem ku hejmarek mezin ji zarok bê xwendin bimînin.

# 12 sal in Helbestvan Imerê Le'lê ji me dûr ketiye

**Kurdistan**

Helbestvan Imerê Le'lê "Rêncber" sala 1935an, li gundê Qeser Dela yê ser bi Cizîra Botan ya Bakurê Kurdstanê ve ji dayik bûye, piştre li Dêrika Rojavayê Kurdstanê jiyana xwe bi rê ve dibir. Xebatkar Imerê Le'lê li ser rêbaza Barzaniyê Nemir xebat dikir, helbesta xwe ya yekê li ser Barzaniyê Nemir bû, her wiha li ser şoreş û xebata Mela Mistefayê nemir nivîsand, ji destpêka damezirandina Partiya Demoqrata Kurdstan - Sûrya "PDK-S" tevlî refên Partiyê bû, ji ber xebata wî di ber doza Kurdî de, rastî astengyan ji aliyê Rêjîma Sûrî ve hat û neçar bû Dêrikê bi cih bihêle û berê xwe bide Herêma Kurdstanê. Le'lê berdewam helbest li ser



hezkirina welat û miletê xwe dnivîsand, piştî derbaskirina jiyaneke xemilandî bi kar û xebat û hezkirina welêt, tûşî nexweşiya pençeşêrê hat, li Herêma Kurdstanê, Turkiya û Şamê careserya xwe ya tendirustî werdigirt, di 6ê Mijdara 2011an li bajarê Girkê Legê yê Rojavayê Kurdstanê çû ber dilovaniya Xwedê û bi merasîmeke cemawerî ya berfereh ji hezkiriyên wî û endam û layngirên PDK-S û tevgera Kurdî li bajarê Dêrikê bi xakê hate spartin.


# Şîlan Doskî pirtûka bi navê Kurdica "Kurdîka" belav kir

**Kurdistan**

Nivîskar û helbestvana Kurd, Şîlan Doskî pirtûkeke nû li ser dar, gul û giyayên Kurdistanê ya bi navê Kurdica "Kurdîka" bi zimanê Kurdî çap kir. Pirtûka Kurdîka, piştî "Gulferheng", berhema duyemîn a nivîskar Şîlan Doskî ya li ser dar, gul û giyayên Kurdistanê ye û ji aliyê Weşanxaneya J&J ya li Diyarbekirê ve hatiye çapkirin. Nivîskar Şîlan Doskî derbarê vê berhema xwe de ji Rojnameya Kurdistan re got: "Kurdîka, lîsteya



navên zanistî yên dar, gul û giyayên Kurdistanê ye ku di pêzanînên baxçeyên cîhanî de, bi navê Kurdica, Kurdistanica (Kurdîka, Kurdistanîka) hatine tomarkirin." Şîlan Doskî herwiha dibêje: "Kulîlkên Kurdistana Rengîn di pencereya cîhanî de geş bûne. KURDICA (Kurdîka-1) mûmdanên welatê me di hişmendiya rojhilatnas, pispor û şarezayên navdewletî de ne." Diyar kir jî, "Kurdîca (Kurdîka) ji bilî lîsteyê jî, cih û warê her gulekê, dîroka ku ew tê de hatiye tomarkirin û navê zanyarê ku ew gul tomar kiriye diyar dike." Şîlan Doskî, nivîskar û helbestvaneke xelkê Duhokê ye, ji biçûkaniya xwe ve ligel malbata xwe koçberî Rojhilatê Kurdistanê kir, piştre koçî Almanyayê kir û niha li wir dijî. Kurdica, berhema sêyemîn a Şîlan Doskî ye ku pêştir wê pirtûka Gulferheng û dîwaneke helbestan a bi navê Hilara Evînê çap kirine.




# Dengvedana Gora



Nehrî Goranî

Zênê, hele rabe qehwekê çêke, va sibê em bi çêja tîrêj û xunavê vexin. Zênê çend roj mane, cejin î nêzîk dibe, divê em tidareka xwe bikin, ji bo siba cejinê, ka bêje: emê çibikin çi nekin, xwestek çine ? Memo wek gerdêşên me û hemisiya bi hev re em diçin serdana gora şekir û xwarinê şêrîn bi xwe re dibin û derin serdana Gorên xwe dikin, gora delalê xwe bi qurbanî bihina axa gora delalê xwe bim, zênê : ê de bêje emê hîn çi bibin? Memo emê kumba jî çêkin, ji ber ku cejin bi çêkirina kuba şên dibe û zarok û mirovên me yê werin ba me rû yê me jî spî be, ê tu zanê. Seka çi gereke emê herin bajarokê xwe ji bo em hûnin. Dilê Zênê şikestî ye, lê li xwe xuyan nake, derd û kesera dadiqurtîne, di dilë xwe de dihêle. Memo: te çewa dîtin kumbe, xweş in? Têbînên te hene? Zênê: tu çi bikê ji xudê de xweş e, ji ber ku bihina destê te dikevî yê, destên te xweş û nerizin, hêviya her cejina be, set be li canê te memo. Memo : em yekê dibên yekê nabin me tidareka xwe kir. Lê haya te jê heye, van ejdeha tu kêl gora nehêştine , tev dizîne û yên nedizîne jî şikandine, weyî mala bavê va talan be çewa em talan kirin , ji van re va zirdariya nemîne. Ev dijiminê mirova ne, û kevir û dar bera ne, dema gotin: dijiminê kalê nabe dostê lawa, karê van yên bapîrê van dizî û talankirin bû, ji bav bavê xwe de wilone, bi xwedê ew di ku re herin li şûna wan kavil dibe, zinar û ax jî dibasin û dinalin, kes wan nebîne. Lê em çi bikin, divê emê ber canê xwe bidin û berxwedankin, Ta xwedê va canî dibe. Memo ma niha dema wa gotinê bû. pişt î temenekî dirêj, bila tu di nav me dabe, tu aramiyê û gerimahiyê didê hundirê me. Zênê: kêl şkand û tişt nehêşt dibin dîsa emê herin seredana gora pakrewana bikin, ez baş dizanim axa gora wan ê şabibe, di wê axê de gitanê Dilo û bêrîvanê bû ye hêvan, hemî dilsozê va axê Ev ax pîroz e giyanên şehîda hembêzkiriye, bi xunava giyanê pakrewanê hemî kulîlk şîn dibin û bihinê evşanî dikin. Wê rojê ez di ber goristanê re derbas bûm, min dengê lîliya û sirûda kir, dengvedana wan bû, weyî memo heyîrano, bi heyîranî wa dengvedanê bim, tenê te bi min re got, li te der din mebê, çi hatî serê te? Xelikê bêjin li te tên xuyan. Zêna delal, tu bawer nake, Ez pê hest dibim Herdem dengê Dilo û bêrîvanê di guhê min de lêdide, Hîna tiştikî din jî te re bêjim Ferimo ew çiye Memo? Zênê: wê rojê piştî bihinvedanê li bin dara zêtûnê min xwe dirêşkir, dem rîşok bi pelê zêtûna re dilîstin, min bihîst Derwêş banga Edûlê dike, wek du vîndar gilgazinca dikin kurtepista wan di guhê min re diçû. MEMO: tirsa min tu jî aşq bûbe, Zênê min jî tij î dengê xwe helokir Bangkir. Zênê ger wan kêlê gora dizîn û şikandin, dar birîn. Ma ê kar bin hulima Axê, vedenga çiya û Newala ji dilê me derînin.

# Dendevrîş (Dirankirosk)



Dr. Munîb Ehmad

Bi Kurdî: Dendevrîş. Bi Latînî: Ammi visnaga. Bi Rûsî: Амми зубная. Bi Erebî: خلة بلدية Bi Ingilîzî: Visnaga daucoides. Welatê Dendevrîşê Rojhilata Navîne û derdora Deriya Sipî û Kafkasê ye. Giyakî dû salane ye ta 1Mitrê dirêj dibe kulêlka wê wekû Siwanê ye rengê kulîlka wê sipî ye. Pêkhateya kimawî :Forankrmon (Kêlîn,Visnagîn )û pîrokûmarîn visnadin û Flavonoîd pêkhateyên Dendevrîşê ne lê Kêlîn pêkhata herî giringe û rêja kêlîn dighê ta 2,5 ji tevaiya Dendevrîşê pîraniya vê kerese di Navikê de ye ,pîştî kû kûlîlk hişk dibê .Beşê kû weke derman ji Dendevrşê tê bikaranin Navika(Tov),ya kû di serê kûlilka wê de cih digrê Şêwayê Tov hûre bibihneke taîbete û tama wê tahle û gezoyeJi Bizrê Dendevrîşê Dermanek he ye bi navê Xêlîn (khilin) ji bo ji navbirina Zixura di Gûrçikê de her weha gelek başe ji bo Qolinc û êşa kû dihinava çê dibê ,Qifara Dendevrîşê bi keskaî tê xwarin.

